

Fêrbûna zimanê kurdî

تعلم اللغة الكردية



daner

Ebbas Isma'îl

إعتماد

عباس اسماعيل

Institut kurde de Paris



Institut kurde de Paris

Ez vê pirtûkê diyari D.p
Kendal Nezan dikim digel rêz
û silavên germ

Abbas Ismail
Çarşemî 22-2-2013

Fêrbûna
Zimanê Kurdî

الكتاب : تعلم اللغة الكردية

المؤلف : عباس إسماعيل

الطبعة الأولى : 2006

الناشر : دار الزمان للطباعة والنشر والتوزيع

دمشق - سوريا : ص.ب. : 5292

هاتف : 5622363 11 00963

00963 92 806808

E.Mail: sherzad@mail2world.com

موافقة وزارة الإعلام بالطباعة

رقم : 90138 تاريخ 2005/9/19

LIV. KL. ARA. 2436

15/07/2017

815 ISM FER

تعلم اللغة الكردية

عباس إسماعيل

Institut kurde de Paris

دار الزمان

Institut kurde de Paris

Pêşgotinek kurt

Tiştê herî giring û pêwîst ewe ku şagirtê zimanê Kurdî bizanê, ka çawa Kurd bi zimanê xwe dipeyivin û taxêvin, wusa jî dinivîsin û dixwênin, ango xwendin û nivîsîna zimanê Kurdî gelekî nêzîkî hevin. Vê yeka han hînkirina xwendin û nivîsîna zimanê Kurdî pir hesanî kiriye, ku ev destûr û yasayên han di gelek zimanên cîhanî de nînin, nemaze wek Erebî û Inglîzî û Frensî... htd. Lewre jî şagirtê zimanê Kurdî dikarê bi zûtirîn dem hînî Kurdî bibê.

Gava pêşî di hînbûna Kurdî de her ewe ku şagirt xwe fêrî awayên dengkirina deng û tîpan bikê, û bi dûde jî xwe fêrî awayên rênivîsa van tîpan di peyv û ristê de bikê, ji bo ku fêrî hersê yasayên bingehîn bibê:

- 1- Çawe zimanê Kurdî tê dengkirin.
- 2- Çawe ew deng têne nivîsandin.

3- Çawe ew tip têne xwendin.

Dema ev hersê yasayên hînbûnê bicî tîn, têgeyandin û danûstandin bi ziman navbera mirovan de drust dibê.

Tîpên Kurdî:

Wek çawe Celadet Bedirxan daniye, Elfebêya Kurdî ji sih û yek tîpan pêktê, ew jî evin:

a b c ç d e ê f g h i î j k l m n
o p q r s ş t u û v w x y z.

Tip ji aliyê durvê xwe ve di nivîsînê de, bi du texlîtan diyar dibin:

1- Tîpên hûr:

a b c ç d e ê f g h i î j k l m n
o p q r s ş t u û v w x y z.

2- Tîpên girs:

A B C Ç D E Ê F G H I Î J K L M
N O P Q R S Ş T U Û V W X Y Z.

Dengdar û dengdêr:

Tîpên zimanê Kurdî ji aliyê dengdanê û bilêvkirina dengên ziman ve, dibine du nîş :

A- dengdêr:

dengdêr ew dengin ku hewa wusa derdikevê bê ku endamek ji dev di riya hewayê de rawestê. Ji van dengan re (vowel = dengdêr = صائت) dibêjin, ew jî heştin:

a e ê i î o u û

Dengdêr du texlîtin:

1- Dengdêrên kurt ku sisêne:

(e, i, u)

2- Dengdêrên dirêj ku pêncin:

(a, ê, î, o, û)

Di sîstima ziman de peyv yan bêje nikarê li ser bingeha dengdêran tenê xwe ava bikê, pêwîstî bi dengdaran heye ji bo ku peyv û riste û gotin bi şêweyekî drust pêkwerê.

B- Dengdar:

Dengdar ew dengin ku hewa ji zengelorê ta di dev û bêhvilê re derbikevê, pêrgî hin organan dibê, ku her ev jî şêweyekî taybetî ji deng derdixê, bo nimûne dengê (m) û (p) bi riya organa lêvê drust dibê.... htd.

Di elfebêya Kurdî de 23 dengdar hene, wek ku Celadet Bedirxan destnîşan kiriye. Eva han jî gelekî nêzîkî li rastiya sîstima dengsaziya ziman kiriye. Inca tîpên dengdar evin:

b	c	ç	d	f	g	h	j	k	l	m	n	p	q	r	s	ş	t	v
w	x	y	z															

Ziman:

Ziman bi alikariya van herdu nifşên dengan: dengdêr û dengdar drust dibê, û bêje û peyv wusa şeweya xwe distênin û her yek ji wan watayekî taybetî didê. Bo vê yekê me du liste ji peyvên Kurdî, ligor hatine her dengêkî yan her tîpekî danîne, ew jî evin:

Dengdêr:

A a	Dar, zar, kal, şar, gar, çak, jar, bar, ban, par
Ê ê	dêr, zêr, kêl, şêr, gêr, çêk, jêr, bêr, bên, pêr
Î î	dîrok, zîrek, kîl, şîr, gîr, çîk, jîr, bîr, bîn, pîr
I i	Diran, zirç, kil, şir, gir, çik, jin, bira, bin, pir
E e	Der, zer, kel, şer, ger, çek, jen, ber, ben, per
U u	Dur, zurne, kul, kun, gur, kuç, kund, kur,
Û û	dûr, zû, kûr, şûr, hûr, çûk, tûr, bûk, bûn rût
O o	Dor, zor, kol, şor, gor, çok, tor, bor, bo, por

Dengdar:

B b	BAZIN, bazin, KEZEB, kezeb, rênçber, berber
P p	PAK, pak, kopal, dep, kepû, pêbend, hesp
Q q	QÊRÎN, qêrîn, qaz, qeseb, porqij, devqîç,
C c	CUWAN, cuwan, cok, ceng, Xecê, gênc, cot
Ç ç	ÇUWAL, çuwal, çar, çeng, kêç, keçel, çepel
D d	DIRAN, diran, diz, doz, dêz, das, badan, sed
F f	FIRÎ, firî, maf, nof, nifş, berf, derf, Fatê,
G g	Gernas, giran, Goran, gêre, dagîr, gur, deng
H h	Hişmend, hezar, hêz, Şehnaz, hoz, har, hûr
J j	Jarman, hejar, jiyan, ez jî ji gund hatim, kej
K k	Kurdistan, kul, kox, rakirin, şapik, keçek
L l	Leyla, lorandin, lal, lolo, lêlê, lalezar, mil
M m	Mizgîn, Xanim, masî, morî, mustrang, mû
N n	Nazdar, Xatûn, nûroz, zinar, narîn, şewnem

R r	Rêzan, raz, rez, berjor, Berzan, rêber, lewre
S s	Sînem, Sîno, sor, nivîsîn, sûtîn, saz, nenas
Ş ş	Şêrîn, şevîn, şapek, şûştin, şaşî, şêst, bareş
T t	Tosinê, tazî, tekûz, betal, çîte, tisî, Tanciro
V v	Vejin, vajî, vîzevîz, hêvî, tov, bizav, heşkiv
W w	Were, wêje, wusa, biwêj, ew, kew, daw, xew
X x	Xunav, xwarin, xwe, xwê, xwîn, xwas, xêz
Y y	Yar, yek, yê min, niyaz, ey, taybetî, hoy, kiye
Z z	Zarîn, zik, zor, bêzo, beraz, zevî, Zînê, rez

Ziman weku avahî û strekçer li ser bingeha van daneyên jêrî pêktê:

- 1- Deng û tîp.
- 2- Kît û morfêm.
- 3- Bêj û peyv û firêz.
- 4- Riste.
- 5- Têkist, yan parçetêkist.

Di vê pertûkê de, mamosta Ebbas Ismayîl xwestiye lipêka teknîka jorî ya rêkxistina daneyên ziman Elîfbêya xwe danê. Bi rastî danîna pertûkên hînkirina ziman li ser vê rêbazê karekî rast û druste, lê ev rêbaz di awayên danînê de û di teknîk û mêtodên xwe de pêwîstî bi şêweyekî taybetî heye, ku ev jî di vê pertûkê de nîne. Ji bilî ku danîna şêweyên taybetî û çapkirina wêneyên rengîn bihakî giran jêre divê.

Beşdariya min di vê pertûkê de, her ew jî di çarçêweya rastkirina rênivîsê de hatiye, herweha min ev pêşgotin û çend parçe têkist jêre danîne.

Li dûmahîka vê pêşgotinê ez û danerê vê pertûkê, Ebbas, bi germî supasiya wî welatperwerê Kurd (E.E.X.S) dikin, ku mifayê çapkirina vê Elîfbayê pêşkêşkir. Supasî bo herkesê ku beşdariyê di xizmeta wêje û ziman û rewşenbîriya Kurdî de bikê, çi bi pênûsa xwe, û çi bi perê xwe û çi bi arîkariya xwe.

Berzo

Havîna 1999

Gulistana zimanê Kurdî

Fêrbûna Zimanê Kurdî

Abbas Ismaîl

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

Tîpa 1

A a

الحرف A - آ- له صوت المدة العربية مثال :

زانا ZANA - دار DAR - آخ AX

يكتب حرف A وكذلك بقية الأحرف الكردية كبيرة
في الحالات التالية :

الحرف الأول من الكلمة الأولى في الكتابة - بعد كل
نقطة- الحرف الأول من أسماء العلم والأسماء الجغرافية وأسماء
المدن والمشاهير والألقاب مثال:

Azad Amed Amûdî Alûsî

وتتألف اللغة الكردية من الحرف والمقطع والكلمة
والجملة والنص مثال :

المقطع = kîr = as ar av

الكلمة = bêje = aso arî av

الجملة = hevok = Aso rengê wê sor û zer e

النص = deq = têkist

* * * *

Azadî

Azadî û serxwebûn bê xebat û lebat bi dest mirov nakeve, ji bo azadiyê gelek celebên xebatê hene, yekemîn xwendin e.

* * * *

Al

Ala me çar reng in, kesk û sor û zer e, sipî ye reng gewhere nîşana alê li ser e.

* * *

Aso شفق

Aramî هدوء

Aheng احتفال

Alozi تعقيد

Aştî سلام

Alav أداة

Armanc هدف

Avend لياقة

Tîpa 2

B b

يلفظ هذا الحرف كالحرف ب في اللغة العربية

Baran باران ~ xebat خَبَات - celeb جَلَب

Bahoz باهوز ~ Bedlîs بَدْلِيس ~ Berf بَرَف

Ba bî bû be

bakur bîst bûk berf

* * *

- Bayê kur xakê dike çekur

- Bîst sal bi lez dibûrin

- Berbû li dor bûkê bûne kom

- Berf li çiyayê Bagokê dibare

* * * *

Birca Belek

Birca belek qesra mîrê Bota ye, ta îro
bermayên wê li bajarê Cezîrê berçav in,
Beko Ewan di vê qesrê de dek û dolabên
kuştina Mem û Zînê digerandin, û dawî
Memo -evîndarê reben- daxistin zindanê ta
ku canbêzar bû, piştre Zînê jî xwe kuşt, soza
xwe bi cih anî.

* * *

Bînahî نظر	Bakur الشمال
Bêje كلمة	Behî سفرجل
Berbang الفجر	Berder خيال
Berdevk الناطق	Berevok مجموعة
Berpan عريض	Berpêk عرقلة
Bextiyar سعيد	Bêdaw سرمدي
Bijîşk طبيب	Bikaranîn استعمال
Bilîmet عبقرى	Bimirûz مرح
Binyat أساس	Birêketin السفر
Birêz محترم	Bizav نشاط
Bizdok خائف	Biziman فصيح

Tîpa 3

C

c

يلفظ هذا الحرف كالحرف ج في اللغة العربية

Ceh جه - qenci قنجي - Comerd جو مرد

tac تاج - Cûdî جودي - Cezrawî جزراوي

ca cî cû cê

can ciwan cûre cênîk

* * *

- Can û ceger bûne birîn
- Welatê me cîwarê me ye
- Gulên baxê me cûre-cûre ne
- Cano kevir li cênîka Cîm xist

* * * *

MîrCeladet Bedirxan gotiye :

Me zanîbû ko xweseriya me di zimanê me de ye, û em bi tenê bi hînbûna xwendin û nivîsandina zimanê xwe û bi parastina wî, di civata miletan de weke miletêkî xweser, dikarin bijîn û payedar bibin.

(Roja Nû: hejmara-1-Gulan 1943)

* * *

Canbaz بهلوان Cankêş مختصر

Cengene غجري Cerg كبد

Cergebez رقصة كردية Cihgirtî مستقر

Civakî اجتماعي Cûre Cûr متنوع

Çadûbaz ساحر Cixizkêş رسام

Tîpa 4

Ç ç

يلفظ هذا الحرف كلحرف (ج) في العربية بعد مد اللسان قليلاً نحو بداية سقف الحلق ويكتب في العربية مثله ولكن بثلاثة نقط.

çiya قيا - bexçe بَخِجِه - qelaç قِلاچ

Çinarê چِناري - Çermûk چَرْمُوك - çima چِما

ça çe çû çê çi

çarde çîvçîv çûk çêl çilo

* * *

- Çarde roj du înin .
- Çîvçîva çûka em gêj kirin .
- Bi qencî çêl min bike .
- Çeto barek çilo çinî .

* * * *

Qada ÇarÇira

Li bajarê Mehabadê paytexta komara Kurdî ya yekemîn ku li Kurdistana Îranê hate damezirandin û li qada çarçira roja 31ê Avdarê sala 1946 pakrewanê nemir Qadî Mihemed sêdardan kirin û bi dilovaniya yezdanê pak şa bû .

* * *

çeleng	نشیط	çargopal	خفکان
çerm	جلد	çavbel	نبیه
çavberk	نظارات	çavhîz	منحط
çavdêr	مراقب	çayxane	مقهی
çax û beng	عنفوان	çespîn	تثیت
çetin	صعب	çik	منتصب
çinar	شجرة الدلب	çîzbûn	تخاذل
çişît	صنف	çîmen	الرياض

Tîpa 5

D d

يلفظ هذا الحرف كالحرف د في اللغة العربية

Derman دَرمان ~ keder كَدَر ~ rind رِنْد

Dara دَارا ~ Dihok دِهوك ~ Dewar دَوَار

Da dî do de dê

Dav dîlan dobelan def dê

* * *

~ Dîno dav li ber çuka vedane

~ Keç û xort diçin dîlanê

~ Dobelan li qelaçan şîn dibin

~ Def û zirne govendê xweş dikin

* * * *

(Azadî û serbestî mîna giya û gulçîçekên spehî ye, yên ko hêdî-hêdî digihin bilind dibin, û ji bona bi xwedîkirina azadî û serbestiyê mêrine qenc divên, yên ko ji dil bixebitin, ji berpirsiyarê ne tirsin, û dizanin bi tenê yên ko dixebitin xelata jî digrin) .

Dr. Kamîran Bedirxan

Roja Nû jimara 10- rûpelê 43

* * *

Dadgeh	محكمة	Devekî	شفوي
Digel	مع أن	Daçek	حرف جر
Damar	عصب	Danasîn	تعريف
Damezirandin	تأسيس	Darbest	تابوت
Daristan	غابة	Dastan	ملحمة
Delav	غدير ماء	Derfet	فرصة
Derya	بحر	Destav	تبول
Destbar	تعاون	Destnivîs	مخطوط

Tîpa 6

E e

يلفظ هذا الحرف كالفتحة في العربية إذا جاء في وسط
الكلمة وآخرها، وكالحرف (أ) إذا جاء في أول الكلمة.

Evîn أفين ~ huner هُنر ~ Eger أَكَّر

Ehmed أحمد ~ Efrîn أفرين ~ çem چَم

em ew ez

erzan embar ezîî

* * *

- Pez û dewar erzan in .

- Ezîz genim xist embarê .

- Ezîî êşek bêhempa ye .

Eve xebata me

Gereke we Kurdên hawîrdorî xwe hînî zimanê Turkî kiribe ?

Wan bersivdan û gotin: Kurd bi nejadiya xwe ve zêde hişkin, ji dêla ku em wan hînî zimanê xwe bikin, em tevde hînî zimanê Kurdî bûne.

Hesen Şiyar

Bîranînên min ~rûpel 326

* * *

Ejdeha تین	Encam نتیجه
Endazyar مهندس	Ezmûn تجربه
Ebone اشتراك	Ecans وكالة
Efser ضابط	Eger سبب
Eylo صقر	Emas التهاب

Tîpa 7

Ê

ê

يلفظ هذا الحرف كالحرف (إ) تحت كسرة في اللغة العربية إذا جاء في أول الكلمة وكالحرف (ي) الخفيفة إذا جاء في وسط أو آخر الكلمة.

Herêm هَرِيم ~ Hêvî هَيْفِي ~ Êvar إِفَار (منطقة)

Mêvan مَيْفَان ~ Êzgeh إِزْكَه ~ Êmo إِمُو

êl êş êm êk

Êlperist êş Êmê êkane

~ Êlperistî kevnepersistî ye .

~ Nezanî êşa bê derman e .

~ Misilman goştê Êkane naxwin .

~ Êma-Hecî qîzek bi nav û deng bû .

* * * *

(Kurd dibêjin: Ma ê wan can e, û ê me bacan e ?.

Gereke em qenciya dengbêj û stiranbêjan ji bîr nekin ko zimanê Kurdî bi pêşve birine û ji mirinê parastine. Ji pencê mirinê û nav lepên zimanê bêgane bi mêranî parastine. Lê miletê Kurd ji ber ko bixwe nezan bû, nikarîbû rûmet û karên giranbuhayên wan nas bike. Nizanîbûn ko şêx û mela dijminê zimanê Kurdîne, dengbêj û stiranbêj pêwanên zimanê Kurdîne..)

Cegerxwîn

jînegeriya min-104

* * *

êşbir علاج

êzing حطب

êzgeh إذاعة

êza مكافأة

êlbat سرب الطيور

Tîpa 8

F f

يلفظ هذا الحرف كالحرف (ف) في اللغة العربية.

Fener فَنَر ~ nefel نَفَل ~ maf ماف

Ferhad فَرهاد ~ Farqîn فارقين ~ Amed آمَد

fa fî fû fo fe

Fatreş fîxan fût fort felek

~ Fîxan û sed ax û eman .

~ Fen û fût pir bûne .

~ Zirt û fort ne karê mêra ne.

~ Wê feleka me rast bigere .

~ Feratê Amedê, di nêzîk bajarê Farqînê
re derbas dibe.

* * * *

Celîlê Celîl dibêje:

Xên ji vê meydanê, di bajêr da, bestek fireh heye, heftê carekê, roja çarşemê gundî ji derdora Efrînê tên bajer, têne vê meydanê berhemên xwe difiroşin.

Zargotina Kurda- Rûpel-16

* * *

Fend خدعة	Ferfûrî خرف
Ferheng قاموس	Fermandarî قيادة
Fermo تفضّل	Ferzane عاقل، حكيم
Fêrkirin تعليم	Fêris حاذق
Firgeh مطار	Fêzbûn غرور، غطرسة
Fort تباهي، افتخار	Fêrgeh مدرسة
Falinc شل	Faqfaq صوت الأرنب
Fehêl تسامح	Felat خلاص
Felît الشاب المراهق	Fermî رسمي
Ferman أمر	Ferxes الحيوان الخصي

Tîpa 9

G g

يلفظ هذا الحرف كحرف (ج) المصرية، ويكتب كحرف الكاف فوقه حركة طويلة في اللغة العربية گ.

Gund گُند ~ bager باگَر ~ mêrg مِیرگ

Gewr گور ~ Gabar گابار ~ Garis گارس

ga gî gê go ge

garan gîsk gêre goşî germ

- Garana gundê Girkundê boş e .

- Avdar gîsko ji tehtê tîne xwar .

- Heyamê berê bi cercerê gêre dikirin .

- Goşiyên mêwa me gelekî girin .

* * * *

Reşîdê Kurd wisa dibêje

Gelo ew neyarên ko li mirina me Kurda dîlezandin û bi vê guftê derew li xwe û me dikirin, îro li pêş vê havila me a mezin û nemir, nemaze ev her çar rojnamên kurmancî ko xwediyê wan, çend rêzên ko bi destê wan hatibû veşartin derdixe çi dibêjin?

Bersiva wan ezê bidim: Bila zanibin em namirin? Em ne ê mirinê ne?.

Roja Nû Beyrût 1944

* * *

Gabelek من الطيور

Gamasî الحوت

Gîsin سكة المحراث

Gastîn الساحة الصغيرة

Gefdan تمديد

Gelemper بشكل عام

Gemsar اهمال

Gemşo مصارع

Tîpa 10

H h

يلفظ هذا الحرف كالحرف (هـ) في اللغة العربية.

Hesin هَسِن ~ mehîn مَهِين ~ meh مَه

Hejar هَزَار ~ Hewlêr هَوْلِير ~ Heleb حَلَب

ha hî hû hê he

havîn hînê hûrizî hêlan heyam

~ Havîn hat buhar hilat .

~ Hînê bajerekî biçûke .

~ Mendal ketine hêlanê .

~ Heyam hatiye guhartin .

* * *

Gelek xortên me ên Kurd hene ko gava mirov bêje wan: Divê hûn çak bixebitin ta ko hînî nivîsandina zimanê xwe bibin, heçko tişteki kirêt dibihîzin, ditengijîn û dibêjin: Qe ji vê re jî hînbûn divê.

Osman Sebrî

Ronahî - hejmar 26 sala 1944 Şam:

* * *

Hagdarî الانتباه	Hogîç كبش
Hêmen آمن، هادئ	Hêsan سهل
Hawîş ساكن	Hejar نحيف
Helbijartin انتخاب	Hempar مشترك
Hemayûn طائر السعد	Hemxak جيران
Hercar دائماً	Herêm منطقة
Herêmdar قائمقام	Heste زناد
Heşmend متنبه	Hevpişk تشارك
Hevok جملة	Hewil السعي

Tîpa 11

I i

هذا الحرف يقابل الكسرة في العربية إذا جاء في وسط
الكلمة أو آخرها أما إذا جاء في أولها فيلغظ كحرف (ا) مخففة .

دنان *dinan* ~ دبستان *dibistan* ~ إبرو *ibrû*

سلاف *Silav* ~ إستانبول *Istanbûl* ~ سرود *Sirûd*

is in bi di

istû incas bista germiyan

- Istiwê hêştir dirêje .

- Incasên dara me tirşin .

- Bax û bistan bişkivî ne.

- Dinan di devê kalo de neman e .

* * * *

(Ey tayê spî!

Min pir ji te gilî û gazin kirinî lê ez dibînim ku ez ne rastimî dîsa tu ji her tiştî ji her kesî bêtir li ba min bi rûmetî li ber çavê min bi qedir dimînî... Serê min ji tere zozan û pîroz be... Tu ji xwe re -mîna tu dixwazî-têde vegezveze Ez dizanim tuî rêberê mirinêyî rêberê wê riyêyî ku tu rê lê na be...).

Qedrî Can

* * *

Nîr û Imbûr Alavên Cotkarin

* * *

Imbûr عدة المحراث

Iskele ميناء

Incî لؤلؤ

Inîşk مرفق

Tîpa 12

Î

î

هذا الحرف يقابل حرف الياء في العربية

Îş إيش ~ Şîş شيش ~ masî ماسي

Îbo إيـبو ~ Şîv شيف ~ Mizgîn مزگين

bî jî dî

bîr jîjo dîrok

- Îsal rewşa me îşkence ye .

- În rojeke pîroz e .

- Îsot li welêt şîn dibin .

* * * *

Îca em hîn bûn bi zimanê xwe bixwînin

Begê bê îman

Dibê rojekê di gundekî weke gundê me de begek hebû, di destengaya feqîra de zadê wan bi elba mezin û erzan dikirî, û di buhayê de bi elba xwe yî biçûk û buha difirof wan .

Mûsa Enter

Birîna Reş -Rûpel 15

* * *

Hîro kulîlkek Spehîye

* * *

îskenc عذاب

îskûre سطل

îspan اسفنج

îstekan كأس، فنجان

îstege محطة

îndek اكليل، تاج

înan عقيدة

îsot فليفلة

îba الحصان الرهوان

îsk اجهاش

Tîpa 13

J j

هذا الحرف يلفظ كالحرف (j) في الإنكليزية ويكتب كحرف (z) فوqe ثلاث نقط بالعربية.

Jor ژور - mejî مَژي - roj روژ

Jîn ژين - Japan ژابان - Jiyan ژيان

ja jî jê jo je

jan jîn jêder Jor jehr

- Jana kezebê dijwar e .
- Jînê dijûn kirin Jala .
- Jêdera me ferhenga jîn e .
- Jora çiya mij û moran e .

* * * *

Hêj mejiyê me hêja ye.

Werin em bixwînin

Rojên we

Rojên we bi serbestî û şadî bin û
hêvîdarim ji yezdanê pak û diloan ko nêzîk
hûnê welatê xwe azad bibînin û têde bi
kêfxweşi cejn û newrozên xwe bi kar binin.

M. Ehmed Namî

daxwazname-Rûpêl 11

* * *

Jar بائس	Jîndar حي
Janazirav مرض السل	Jend حلج
Jankêşan معاناة	Jehî وتري
Jevek الفاصلة	Jêder المصادر
Jêdander اعتراف	Jibil بدون
Jinbî أرملة	Jêhatî ماهر. شاطر
Jiyandin إحياء	Jîrkok لطيف

Tîpa 14

K k

يلفظ هذا الحرف كالحرف (ك) في العربية.

kûz كوز - serkan سَرَكان - belek بَلَك

Kewar كَوار - Kerkûk كَرَكَوك - Kiras كِرَاس

ka ke ku kî kû

kal keftar Kurd kîn kûp

- Keftar gelekî kê m bûne .
- Kurd miletek kevnar e .
- Şerme karê me dijîtî û kîn be ?.
- Kûpê rûn ji dest kebaniyê ket .

* * * *

(Kurdino, karkirê xwe bin, şêrinê ber dilê hevala bin) .

çemê Bûnisra

çemê Bûnisra (Çeqceq) di dîrokê de Navê Wî Hirmase. ev çem ji du kaniyan dertê Kaniya sipî û kaniya reş. ev çem dadikeve Berya Mêrdînê û di Bajarê Qamişlo re derbas dibe. li bajarê Heseke Ji Tevlî çemê Xabûr dibe

* * *

Karûbar شوون	Kedî أليف
Kêlik لحظة	Kişwer مملكة
Konger مؤتمر	Kaj صنوبر
Kamax الورك	Kole عبد
Karbidest موظف	Kartol بطاطا
Kavil الأطلال	Kayîn اجترار
Keçel الأقرع	Keya مختار
Kelepor ميراث	Kênfis سلحفاة
Keleşêr الديك	Kêş الوزن

Tîpa 15

L 1

يقابل هذا الحرف في العربية حرف (ل).

Lal لال ~ kelek كَلَّك ~ kal كال

Leyla ليلى ~ Laleş لَالِش ~ Lav لاف

La lo lû le lê

Landik lod lûs legan lêlav

- Mendal di landikê de dileyizin .
- Lewend loda kayê dimale .
- Legleg avê ji leganê vedixwe .
- Lêlava berfê bûye lehî .

* * * *

Salar û Mîdya

Ez dil nexweşim, derketim ji mal
dixwazim herim, tenha bê heval
çiya bi carek, rêl û daristan
hemî dagirtin, bax û gulistan
ez xweş dikşênim, hilmê ji sorgul
xweş tê guhê min, awazê bilbil .

Cegerxwin

Salar û Mîdya Rûpel 10

* * *

Lavekar	متوسل	Lav	هرولة
Lîzgeh	ملعب	Laçer	مری
Laçîn	الصقر	Lafirand	ابتلع
Laperîn	التكتل	Lawaz	هزىل
Lehek	صابون	Leheng	بطل

Tîpa 16

M m

يقابل هذا الحرف في العربية حرف (م).

Maf ماف - name نامَ - dotmam دوتمام

Mand ماند - Mêrdîn میردین - Merez مَرَز

ma mî mo mê mû

malbat mîdî movik mêvan Mûş

- Celadet ji malbata mîreka ye .

- Kurd ji nijadê mîdî ne .

- Mûş paytexta zozana ye .

- Movikên pişta Memo şikestine .

* * * *

Çilsaliya Mîr Celadet

Erê çilsal di xew de mîr Celadet
ne bes êdî heya vêga tu razî
çiças em bandikin, pêjna te nayê
emê çibkin, ne hewar û ne gazî
keç û xortan bide xwendin tu îro
ji destpêka Alifbayê bi nazî.

Tîrêj

Dîwana 3_ rûpel 150

* * *

Mak أصل	Mand مستقبل
Mandel إنكار	Matbûn حيرة
Mendal طفل	Merc رهان
Merez مرض الطاعون	Merês اللباقة
Mêwe الفاكهة	Mase طاولة

Tîpa 17

N n

يقابل هذا الحرف في العربية حرف (ن).

Nav نائف ~ nan نان ~ nîşan نیشان

Nalîn نالین ~ Nisêbîn نسیبین ~ Nehrî نهري

na ne nû no

nasname neman nûner noş

- Nasnama min winda bûye .

- Yan Kurdistan yan neman .

- Nisrîn nûnera komîta nivîskara
ye .

- Derman vexwe, noşîcan be .

* * * *

Lingê bê desmêj

Rojekê dinêrin ku Melê Meşhûr nimêj dike, lê lingê xwe yê çepê dirêjî derê secadê kiriye. Dema kû sedemê vê yekê jê dipirsin, Melê weha bersiva wan dide:

Dema ku min desmêj girt, av qediya û lingê min ê çepê bêdesmêj ma.

M. Emîn Bozerselan

Pirtûka Melayê Meşhûr Rûpel 5

* * *

Nimûne	مثال	Nûçe	خبر
Nanpêj	فران	Narîn	عفاف
Nasname	الهوية	Nasker	معروف
Navçe	مقاطعة	Nazdar	رفيق
Nelihevî	اختلاف	Nemaze	خاصة
Nepend	مستو	Nerx	الثلث

Tîpa 18

يَلْفِظُ هَذَا الْحَرْفَ كَمَا يَلْفِظُ الْحَرْفَيْنِ (أَوْ) مَعاً فِي الْعَرَبِيَّةِ مَعَ
فَتْحِ الشَّفَتَيْنِ قَلِيلاً أَثْنَاءَ اللَّفْظِ إِذَا جَاءَ فِي أَوَّلِ الْكَلِمَةِ أَمَا إِذَا
جَاءَ فِي وَسْطِ وَآخِرِ الْكَلِمَةِ فَيَلْفِظُ كَحَرْفِ (و) مُخَفَّفَةً.

Oldar أولدار ~ kolos كولوس ~ lalo لالو

Orimye أورمية - Ordek أوردك - Orarto أورارتو

or ol orîn oldar

-Orîn bi gayê nav garanê ket .

-Oldar diçin Laleşê .

-Mamosta gola orimya nexşand .

-Kurd bermayên gelê orarto ne .

* * * *

Cejna Newrozê

Newroz di dîroka gelê Kurd de rojke ronake û geşdarê. Ev roj nîşana xebata gelê Kurd e li dij stemkarî û zordariyê. Herweha despêka serdemekê nû ye di dîroka gelê me de yê ku bi mêranî xwe ji bin nîrê dijmin rizgarkir, weha jî rojke nû ye di jiyana gelê me de hilat, her ew jî ew bû ku Kawa yê hesinkar serkeftinek mezin bi cih anî, dema ku Ejdehakê xwîn mij kuşt.

Berzo Mehmûd

* * *

Olî غرفة عالية

Oldar متدين

Olam سخرة

Orîn الخوار

Oste معلم

Olzan مفتي

Tîpa 19

P p

يلفظ هذا الحرف كحرف (p) في الإنكليزية بتشديد الشفتين ويكتب في العربية كحرف (ب) تحته ثلاثة نقط.

pênûs بينوس ~ bapîr باپير ~ tîp تيب

Perîzade پيريزاد ~ Palo پالو ~ Pîranî پيراني

pa pe pê pî po

par pezkorî pêder pîran por

- Para geroka çû babîsoka .
- Pezkovî li Sîpanê xelatê hene .
- Pêder bi her tiştî dizane .
- Pîran warê Şêx Seîd e .

* * * *

Pîrê xemcivîn

Ez bûm pîrê xemcivîn
bê hiş û mest û jêr nivîn
li dil vebûne sed birîn
ji ber evîna şoxa şêrîn
bilbil civanê gulê ye
evîna te ez pîr kirim
bê can û hem bê bîr kirim
bê çar kirim, xem barkirim

Sebrî Botanî

* * *

Pak مقدس

Pût تمثال

Pend حكمة

Pronav ضمير

Paje نافذة

Parastin حماية

Parêzger محامي

Paytext عاصمة

Tîpa 20

Q q

يلفظ هذا الحرف كحرف (ق) في العربية.

Qurban قُرْبَان ~ seqa سَقَا ~ Qamişlo قَامِشْلُو

Qeşemê qaq Qezwîni

qa qe qo qi

qaz qeşa qolan qij

* * *

- Qaz û quling bilind dirêsin .

- Berf û qeşa li quntara çiyana dimîne .

- Qîz li mala bavê, kes nizane nesîbê kê .

- Qûç nîşana sînora ne.

* * * *

Hacî qadirê koyî

Hacî Qadirê Koyî navekî herî girînge di nav Kurdan de. Hacî helbestvanekî payberze, bi taybetî di meydana Kurdperweriyê de. Di sala 1232 H, li gundê «Gorqereç», nêzikî Koysinceq, hatiye dinyayê. Hacî temenê xwe di hişyarkirina miletê xwe de derbas kiriye. Hezar rehmet li canê wî bê.

* * *

Qad میدان	Qendav قطر السكر
Qapan غرور	Qat طبقة
Qedexe ممنوع	Qerekol مخفر شرطة
Qertel نسر	Qiral ملك
Qise حديث	Qonax مرحلة
Qeraş طحان	Qeresûn ثلاجة
Qerwaş خادمة	Qeşeng جميل
Qewartî بحوف	Qewitî الوصية

Tîpa 21

R r

يقابل هذا الحرف في العربية حرف (ر).

Rast راست ~ Ferat فرات ~ hewar هوار

Rewşen روشن ~ Raco راجو ~ Rada رادا

ra re rê rû ro

razan reş rêber rûn roj

* * *

~ Razan li bajarê Ruhayê xweşe .

~ Rûn li axêk, û li ber axêk .

~ Kovara Roja Nû kevnar e .

~ Çarşema reş cejneke Êzîdiya ye .

* * * *

Rabe ji xewê

Rabe ji xewê çavê raketî, dilêm şewitî
agir pêketî

Şêrîna min çû tu dil vêketî, dê çi bikim
îro ji dest min derketî

Şêrîna min bir zalim neyara, ez mame
feqîr li ber dîwara

Ez bang dikim qêrîn hewara kî ser
hilîne, ki ji xew şiyara .

Yûsif Berazî (Bê bihar)

* * *

Rêl غابة

Rij غير دسم

Rîçal مری

Rave شرح

Rewrewk سراب

Rada واصل

Ragihandin ابلاغ

Raman فکر

Tîpa 22

S

s

يقابل هذا الحرف في العربية حرف (س).

Sewal سَوَال - pesar بَسَار - kiras كِرَاس

Sêvê سَيْفِي - Sêrt سِيرَت - Silîvî سَلِيْفِي

Sa sî se so sû

Sason sîr sema sor sünd

* * *

-Sason û Sîpan û Sefin çiyane bilind in .

- Sîr li deştê şîn dibin .

- Sünd qeweta bazarê ye .

- Sal bi sal, xwezî bi par.

* * * *

Selaheldîn

Sultan Selaheldîn yek ji şahên herî giring bû di cîhanê de, Selahedîn ji Êla Rewadî ya Kurdî ye, cîwarê vê Êle li Kurdistana bakur e, ser sînorê Ezerbêcanê ye, vî şahê bilind dikarîbû dewleteke mezin ji miletê xwe re ava bike, lê mixabin xwe ji stûna Islamê berneda, û keda wî ji me re bê sûde çû.

* * *

Salox	خبر	Segman	قناص
Sawîr	شبح	Sazîn	تنسيق
Sazbend	موسيقار	Sazkirin	تجهيز
Sehkeran	حواس	Sedem	سبب
Seqa	طقس	Serbarî	عالة
Serbixwe	مستقل	Serdan	زيارة
Serdest	سيد	Serfirazî	شرف

Tîpa 23

Ş

ş

يقابل هذا الحرف في العربية حرف (ش).

şoreş شورش ~ başûr باشور ~ dabaş داباش

Şivan شقان ~ Şeqlawe شقلاو ~ Şikakî شكاکي

şa şî şo şû şe

şal şinahî şolik şûv şev

* * *

- Şal û şap kincên Kurda ne .

- Şeva reş ji êvar de reş e .

- Şûva sêgîsin rewşa xwedî xweş dike .

- Şinahî nîşana çema ye .

* * * *

Şermîne dil

Şermîne dil dê çawa şev çirakim tariya
Bo dê bêjim, har û gêjim dil verêjim, min viya
Lew şêrînê, nazenînê em ketin derdê girînê
Rewşen û şoxa dila, xanzada textê evînê
Ew buhar li dêmê riştî lê belav bin lal û gul
Lew dixwînit kew bi sohtin hêr û jana ev ro dil
Ger me zanî tu çi rengî, da bîna me hêt
Ne torîn û ne perî ne meya me ji dil divêt
Sed hezar torin û perî bibne gorî te delal
Çi meya ji lêva dibarît, bi renekî sor û zelal.

Bedirxan Sindî

* * *

şano مسرح

şeng أنيق

şimşat مصقول

şagirt تلميذ

Tîpa 24

T t

يقابل هذا الحرف في العربية حرف (ت).

Tore تورَ - gotar گوتار - qiset قِسَتْ

Tîrêj تيريز - Tatwan تاتوان - Torî توري

ta tî tê tû ti to

tajî tîş têt tûtin tibab toz

* * *

~ Tajî hene û tol tajî hene .

~ Tîr û kevan winda bûne .

~ Têkoşîna Kurda berdewam e .

~ Em tibabekî ser piya bi rê ketin .

* * * *

dibistan

Dibistan ew dere ku em tê de dixwênin. Ji zarowên dibistanêre şagirt dibêjin. Ez jî şagirtêkim. Mamosta dersa şagirta dibêjit, şagirt guhdar dibin, qenc bala xwe didin ku rind têbigihin û hîn bibin.

Mîr Celadet Bedirxan

Hawar, hej 3- rû 7

* * *

Talan هب	Tekûz تام
Tengal خاصرة	Têvel مختلف
Tengav مضيق	Tol ثار
Texlît نوع	Torin حفيد
Tezandin تجديد	Teror ارهاب
Tivtivandî مزین	Tîrêj شعاع
Torevan أديب	Tûnc برونز

Tîpa 25

U

u

هذا الحرف يقابل الضمة في العربية إذا جاء في وسط
الكلمة أما إذا جاء في أولها فيلفظ كالحرف (أ).

ustû أستو ~ gur كُر ~ Kurd كُرد

Umer أمر ~ Urfa أُرفا ~ Buhar بُهار

Us us ur um

ustû uş Urfa umbûr

* * *

~ Ustiwê dijminê Kurda bişike .

~ Uşta paşketina me nezaniye .

~ Li Urfa umbûrên cot çêdikin .

* * * *

Keça Kurd

Keçê rabe serî hilde di vê çaxê weha nabî

Binêr jin çûne ezmana, heta kengî di xew da bî?

Dixwezim zû bixwênî xweş, ji ser rû rakî çara reş

Tu gavan pêşde bavêjî, wekî Endêr û benda¹ bî

Çine ev çarik û pêçî, di rexta de xwe rapêçî

Bi destê te kelaşinkof, bera zana û xwenda bî .

Cegerxwîn , dîwana 3

* * *

Ustû عنق

Urfa مدينة أورفا

¹ - Bendera Nayka: serok wezîra sêlanê, Berê.

Tîpa 26

Û û

هَذَا الْحَرْفُ يُقَابِلُ حَرْفَ (و) فِي الْعَرَبِيَّةِ

ûr أور ~ tûr تور ~ mû مو ~ Rûn رون

Ûmîd أوميد ~ dûr دور ~ birû برو

ûm ûr rû

* * *

- Ûmîda me em rizgar bibin .

-Tûrê mala Temo mişka kurkusandiye .

- Kurd dibêjin: Werin ûrê ga rijiya
ye ? .

* * * *

Cana min

Cana min cana min ... tiwî êş û jana min
Kî zane ez kîme ... bê te çiyê mana min
Navê tey Şêrînê ... dirûv û nîşana min
Dêmê sor çavê reş ... bizav û semyana min
Newrozê dirokê ... xelat û sîpana min
Yara dil revandî ... tiwî bêrîvana min
Destê te bernadim ... li ser te fermana min
Xweş mêrim xwenda me ... qada te
meydana min
Hevkarî yekîti ... rêç û dibistana min
Rizgarî azadî ... evîn û peymanî min
Helgurd im ez tême ... rabe gulistana min

Ahmedê Şêx Salih

Êndîwar

* * *

مرموق ئۇزەر

معدلة ئۇر

Tîpa 27

V

v

يلفظ هذا الحرف كالحرف (v) في الإنكليزية ويكتب في العربية كحرف (ف) فوقه ثلاثة نقط.

Vir فر ~ tav تاف ~ أفين evîn ~ قالا Vala

Vîn فين ~ Viyan فيان ~ Vînos فينوس

va vî vi ve vê

vale vîlik virek veger vêl

*

*

*

~ Vaye şar û va mişar .

~ Çûn hebe veger tune be .

~ Her gav dijmin vîlika digêrîne .

~ Viyan valahiyê li ba xwe nabîne.

* * * *

ZIMANÊ NETEWÎ

Ziman nasnameya neteweye. Ziman awêneyeke, mirov dikarê, ne tenê dîroka xwe tê de bibînê, lê belê çîrok û helbest û pend û felsefa xwe jî tê de bixwîne. Lewre ziman temenekî xweyî dûr û dirêj heye, bi dema peydabûna mirovanve girêdayîye. Bo vê yekê, ya baş ewe ku tevgera Kurdî giringiyekê bidê zimanê xweyî netewî, û vê yekê jî bikê beşek ji kar û xebata xweyî rojane re.

Berzo

* * *

Vexwend دعا إلى

Virnî متأخر

Vedan نصب

Vajî عكس

Vegotin تنبأ

Vejanî احياء

Volqan برکان

Vîn الإرادة

Tîpa 28

W

w

يافظ هذا الحرف كحرف (و) مخففة في العربية

War وار ~ newal نوال ~ saw ساو

Welato ولاتو ~ Wan وان ~ Westa وستا

wa wê wî wi we

wate ~ wêrek ~ wîrewîr ~ winda ~ werîs

* * *

- Gotinên wezîr çewt in bê wate ne .

- Werşek lawirek wêrek e .

- Wîrewîra şagirtên dibistanê ye .

- Keda mirovê zîrek winda nabe .

* * * *

Bajarê Hewlêr

Hewlêr bajarekî pir binav û deng e di Kurdistanê de, ji bilî ku yeke ji wan bajarên herî kevine di dîrokê de. Dema Megolî gihaştine Kurdistanê, sala 1235-1236, hawîrdora kelha Hewlêrê girtin, lê piştî 45 roja şer kirin, nikarîbûn kelhê bixin bin destê xwe, neçar bûn xwe ji dora wê bikişênin. Hewlêr di roja îrode bajarekî mezin û gewreye, û bûye paytexta herêma Kurdistana Iraqê.

* * *

Westa	تعاب	Wêran	خراب
Wergerîn	ترجمة	Welatî	مواطن
Werşek	الفهد	Weyn	الكيد
Wêjeyî	أدبي	Wican	عطلة
Wênegir	مصور	Wêrand	شجع
Weşyar	ناشر	Wate	المعنى

Tîpa 29

X X

يقابل هذا الحرف في العربية حرف (خ).

Xelat خلات ~ rexne رَخْنَن ~ ax آخ

Xebat خَبَات ~ Xaneqîn خَانَقِيْن ~ Xani خَانِي

xa xe xo xû xî xê

xal xem xort xûz xîp xêr

* * *

- Xala xwarzê Rakirin, ama birazî dakirin

- Xorto: Bixwe nanê tisî, û nebe kolê kesî .

- Welatê me tev xêr û bêr e .

Xwîna pakrewana bê sûde naçe .

* * * *

Xwendin

Bi dirêjahiya dîrokê, weha diyare, ku xwendin rêçeke pir girînge ji bo wergirtina zanîn û zanistê, ya ku bi xwe roniyêke geşê bo mirov bikarin li berê riya xwe biqelêşin û ji tariyê derkevin û bidin ser rêça xebateke zanyarî, xebateke bê serhişkî, xebateke Kurdane, û dûrî birakujiyê. Di riya xwendinê De em dikarin xwe nas bikin, û doza xwe bi xelkê bidin naskrin.

Berzo

* * *

Xûntal فظ

Xal نقطة

Xeml زينة

Xame قلم

Xapandin الخداع

Xorşîd الشمس

Xernûb عوسج

Xoşav شراب

Y y

يلفظ هذا الحرف كالحرف (ي) مخففة في العربية

Yezdan يزدان - dadyar داديار - mey مَي

Yara يارا - Yasa ياسا - Yekser يَكْسَر

ya ye yû yî

yar yek Yûsif Yilmaz

* * *

~ Yilmaz Guney hunermendekî bi nav
û denge.

~ Yadê peyveke gelek şêrîn e.

~ Yûsif navê Sultan Selaheldîn e .

~ Yekî baş himber sedê pîs e .

* * * *

Kurd û serhişkî

Pêşiyên me ji kevin de gotine: «Cihê peyvekê tenê di serê mirovê Kurd de heye. Çi kesê gihaştîyê û peyva xwe xist serê wî de, cih ji peyveke dîtirre namênê». Bi rastî ev gotin gelek xirabe, her ev jî nîşana serhişkiya mirovê Kurd berçav dikê. Pêwîste cihê hezarê peyvan di serê me de hebê, yan jî emê nikaribin tiştêkî ji hev derbixin.

* * *

Yasa قانون

Yekser مباشرة

Yekcar مرة واحدة

Yar حبيب

Yexte كدیش

Yarîgeh ملعب

Yal عرف الديك

Yekbûn اتحاد

Tîpa 31

Z z

يقابل هذا الحرف في العربية حرف (ز).

Zinar زِنَار ~ hezar هَزَار ~ werz وِرْز

Zevî زَفِي ~ Zab زَاب ~ Zîbarî زِيَارِي

za ze zû zî zo

zar zeber zûrîn zîrek zor

* * *

- Zar û zimanê me şêrîn e .
- Zor teraziwa dadê dadigerîne .
- Zîna mîrê Bota pir zîba bû .
- Yê zîrek dibe mîrek .

* * * *

Daxwaza min ew bû, kitêba min zûtirîn
 bi zimanê Kurdî bê belav kirin. Her çend
 deh sal jî di ser re derbaz bûne, ez gelek
 dilxweş im ku daxwaza min bi cih hat.

Dr. P. E. Qasimlo

Kurdistan û Kurd -Rûpel- 13

* * *

Zam جرح

Zevî -حقل

Zanistî علمي

Zarav اللهجة

Zayend الجنس

Zemîndar مزارع كبير

Zirzop وقع

Zîxan فروج

Zikmak وراثي

Zirrek مشاكس

Zindî حي

Zemîn أرض

Zar ضعيف

Zindan سجن

Zikreş حقوق

Ziyan ضرر

Zivir خشن

Zozan مصيف

Zingar صدأ

Zîvar قطعة

صدر عن دار الزمان

- شرفنامه ج ٢/١ - تاليف : شرفخان البدليسي
ترجمة محمد علي عوني .

- قواعد اللغة الكردية ، تاليف : رشيد كورد

تحت الطبع

- مشاهير الكرد وكردستان ج ٢/١ - تاليف : العلامة محمد
أمين زكي بك ، ترجمة : ج ١ : السيدة كريمته . ج ٢ : محمد
علي عوني .

- مع روائع جكرخوين (الشعرية) ، اعداد وتقديم :
عبد الوهاب الكرّمي (ملاي كورد)

- شذى الطفولة في سانات - احوال قرية مسيحية في
كردستان العراق ، مذكرات : أفرام عيسى يوسف ،
ترجمة : نزار أغري

- نداء اللازورد ، مجموعة قصصية ، تالف : وجيهة سعيد

- كان يا ما كان - قراءة في حكايات كردية ،
تاليف : نزار أغري .

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

سوريا مثلما هي غنية بطبيعتها الجغرافية الخلابة، حيث تجد فيها السهول الفسيحة والجبال الشاهقة والوديان السحيقة، تغطيهم أنواعاً لا حصر لها من الأشجار والنباتات والأزهار المختلفة، فهي كذلك غنية بسكانها الذين يعودون إلى قوميات مختلفة وأديان عديدة، كل يتحدث بلغته ويعيش وفق ثقافته، ويشكلون بمجموعهم فسيفساء يعكس العمق الحضاري والثقافي لهذه البقعة من العالم التي طالما قيل فيها انها مهد الأنبياء وأرض الحضارات وموطن أولى الأبجديات.

هذا الكتاب هو بمثابة دليل للقارئ الكردي، الملم باللغة العربية يرشده إلى تعلم لغته القومية، بأسلوب رشيق يجمع بين لذة التعلم ومتعة المعرفة من خلال التعرف على جوانب من الثقافة والأدب الكرديين.

الناشر



دارالزمان

للطباعة والنشر والتوزيع